**HENAR weku yek ji pîrozwerî û sembol di çanda kevnare ya Kurdî de**


**Pênase**:
Henar weku gelek pîrozwerî û sembolên di dîrok, çand û baweriya Kurdî de, xwedî cih û mekaneke giring û diyar e. Di nav Kurdan de mêweya "Henar"ê têgîn û wateyeke ruhî ya wê heye û weku sembola vejîn, jiyan û nûvebûyê ye.

**Peydabûna Henarê**:
Pirranî çavkaniyên dîrokî weha şan didin ku destpêka peydabûna mêweya Henarê li Kurdistanê bûye û ji Zagrosê çêbûye û belavê dunyayê bûye. Hinek din behsa Kurdistanê heta bakurê Hîndistanê dikin. Hinekê behsa Anatolyayê û hinekê jî behsa rojhilata Îranê dikin, anku hemû çavkaniyan peydabûna wê vedigerînin Kurdsitana mezin û Zagrosê. Henar weku mêweyeke xwezayî reha wê kûr û dûr e, lê weku heşîn û çanda wê, li Kurdistanê dîroka wê vedigere zêdetirî pênc hezar salan berê

**Navê wê**:
Navê Henarê weku yekemîn çavkanî ku dîroka wê zêdetirî pênc hezar salan berê ye hema hema weku xwe maye di nivîsên ser latên Sumeriyan de bi navê "**Nûrme** yan **Nûr**"ê hatiye tomar kirin ku îro bûye "**Nar** yan **Enar** yan **Henar**"ê.

**Di felsefeya Mîtrayî de**:
Henar di destpêka şaristaniyê li Zagros û berjêra wê Mezopotamyayê de weku dara pîroz "The Sacred Tree"yê xwedî roleke giring û mezin bûye di bîrûbaweriyên Kurdî û herêmên derdor de ku li ser kevirên kolandî vê yekê tê dîtin ku pirranî caran dar Hnear bûye. Henar yek ji pîrozweriyên felsefe û baweriya

Mêhr-Mîtrayî ye ku fena kevintirîn fikir, felsefe û dînê Kurdî tê pênase kirin. Henar di baweriyên Kurdî de sembola dayiksalarî û zayinê ye, hêma û sembola gerdûn û ruhmê jinê ye, nîşana şîfa û vejînê ye, di heman demê de nîşana pît û bereketê bûye û ji aliyekî din ve jî di kevin de nîşana arezûyên cinsî, hêz û şiyanê bûye.



**Henar di nava neteweyên din de**:


Di nava neteweyên din de jî xwedî pîrozwerî û wateyên din bûye her ji Misiriyên kevin hetanî Mezopotamya, dînên Cihû û Xiristiyan, welatê Çînê yd.. Her weha Li Babilê di dema Kasiyan de ku bo heyama sedan sal herêma Babiliyan di destê wan de bû, lê bi esil ew Zagrosî bûn, di gorrên wan de gerdenî û milwankên şêwe Henarê hatine dîtin ku dixuye di bin nabdora wan de mijara pîrozweriya Henarê ketibe nava Babilyên Samînejad û Aşuriyan jî, ji ber ku dûre di nava Aşuriyan û dînê wan de henar di kavirên kolandî de Henar bûye û gelek caran dara pîroz jî Henar bûye.

**Henar di nava Yarsanî, Zerdeştî û Êzîdiyê de**:

Her sê dînên paşîn anku "Yarsanî, Zerdeştî û Êzîdî" ku her sê dîn jî di reh û rîşe de sê şaxên Mîtrayî ne, dîsan mêweya Henarê xwedî pêgeh, rol û pîrozweriyeke mezin û giring e bi taybet di nava Yarsanan de xwedî wate û ramaneke mezin e. Di çîrok û beytên Yarsanî de Henar roleke mezin dibîne, her weha şikandina Henarê di nav Yarsanî û bi taybet di Cemxaneyan de yek ji dabên wan nin. Di warê mîtolojîyê de yek ji çîrokên herî dyar di nav Yarsanan de ku nêzî heman çîroka "Îsa Mesîh û Meryem Pakîze" ye, çîroka "Baba Yadgar û Sara Pakîze" ye.

*Tê gotin ku San Sahak(Sultan Sahak) darê destê ŞahÎbrahîm dide Pîr Îsmaîlê Kolanî taku wê binax bike, Pîr Îsmaîl wî darî binax dike û hêdî hêdî şîn dibe û mezin dibe û dibe dara Henarê, piştî çend salan wê darê ber dide û dûre lebên wê diçînin û dûre ji berên wê cemekê pêktînin, Henar di nava xelkî de tê parve kirin, piştî parve kirinê "Dada Sara"yê ya keça Pîr Mîkaîl ku wê dest ji dunyayê berda bû, Xaneqayê gesk dide, leba Henarekê dibîne li ser xalîçeyê, Dada Sara wê lebê dixwe û piştî demekê ducan dibe, kurekî wê çê dibe ku navê wî dibe "Baba Yadgar". Xelkî dilpîsî ji Dada Sarayê*

*dikin ku çawa bê zewacê ducanî bûye, lew San Sahak ferman dide Dawud ku Baba Yadgar bixe nava Tenûrê bo heyama sê rojan, piştî sê rojan ku serî tenûrê vedikin, Baba Yadgar bi saxî ji tenûrê tê der.* Di vir de rola Henarê di dîrok, çand, bawerî, mîtolojî(Efsanenasî) û dînên Kurdî de xwedî pîrozwerî û wateyên mezin e ku van kod û kokan bandor daniye ser xelkên derdorên Kurdistan û Zagrosê jî.



**Di cejn û şeva Yeldayê de**:

Di cejn û şeva Yeldayê ku kevin jêre digotin cejna Mêhr yan Mêhra ku şeva xorveger û zadebûna Mêhr û Mîtrayê ye. Henar weku sembol û pîrozweriya vê şevê tê danîn û merca pîrozkirina vê şevê ye ku sembola û wateya zayin, vejîn, nûvebûn û jiyanê ye.




**Henar di wêjeya Kurdî de**:


Kurd û xweza duyeke ji hev necuda ne, Kurd weku zadeyê Zagros û berjêra wê Mezopotamyayê serkarê şaristanî, avakar û baweriyê bûye, dîn, fikir û felefeya Mêhr-Mîtrayî rastiya wê dide şan. Ji ber ku Kurdistana mezin serzemîna çiya, kanî, gulzar, heşîn û rengaliyê bûye, Kurd jî weku zadeyê vê axê hemrengên wê xwezayê bûye. Jib o her dem û demsal, her mêwe û heşîn, her dem û der, wate, cejn û boneyê daye şan dan. Henar yek ji wan pîrozwerî û

semblance ku di dînê Mîtrayî, Mîtolojî û wêjeya Kurdî de jî roleke mezin dibîne. Di beyteke folklorî de weha pesna Henarê tê dayin:

Waçe be qîbleyim xem nawero dill
Merkatêye bew we henar kero gull
Henarî gull henarî, henarî Ehmed Awa
Tirş û şîrîn û mêxoş, nawekey pirr le aw e
Henarî gull henarî, henarî hemro reş e
Îman le qelb im nema, witiyan yar im nexweş e
Henar henar henar e, henarî dane dane
Ser rêgeket lêdegirim, wek Hemetalî Bane
Henaran û hencîran, manî newî destgîran

Her weha hezretê “Mewlewî” bi vî awayî Henarê dixe gulzara helbestê ku dibêje:

Şineftim dûr ba leyl zûkamşen
Dîşwar ballay newnemamşen
Pîşyayî kûrey nar eşiq wêş
Be mewdayî mûjgan sûraxiş kero
We germî nîşan demaxiş dero




**Tomara Sembola Hennarê Yunskoyê de**:
Rêveberê Mîratê ya çand û geştyariya Kirmaşanê tîmeke pispor daye avakirin bo date û komkirina belgeyên li ser sembola Henarê weku semboleke Zagros û Kurdistanê di sîya dîrok, ol, çand û nasnameya Kurdî de ku ji Yunskoyê re weku dateyên cejna "Şukrane"yê ku ew jî pajeke ji dosya cîhana Hewramanê ku weku mîrateke cîhanî li Yunskoyê hatiye tomar kirin. Lê mixabin li Azerbaycanê ya nejad Kurd û ziman guhertî, dosya amade kirine û dane Neteweyên Yekbûyî ku cejna Henarê weku mîrateke Azerbaycanê bê tomar kirin. Hêjayê gotinê ye ku Hem Azerbaycan û Hem Ermenistan mîrata pîrozweriya Henarê di bin bandora nasnameya wê ya hezaran salî ya Zagors û Mîtrayê Henarê pîroz dibînin û ew jî weku "Newroz, Yelda, Tenbûr" yd.. dixwazin bazarî li ser nirxên Zagros, Mezopotamya û dîrokên kevnareya Kurdî bikin.

**Curê û Bazarên Henarê**:
Li başûrê Kursitanê çandina Henarê bi awayeke berçav zêde bûye û baxên Henarê %90 zêde bûye, niha li Kurdistanê zêdetirî 26 curên Henar hene û tên çandin, Bajarê Helbece û Hewramanê bûye merkeza Henarê û salane li bajarê Helebce cejn û festîvala Henarê birêve diçin, her weha li rojhilata Kurdistanê û herêma Hewramanê jî festîvala Henarê birêve diçin ku têde her curên Henarên Kurdistanê têne numayiş kirin û salane li başûrê welêt 25 bo 30 ton Henar tên berhem anîn û raşana derveyî welêt jî tê kirin bi taybetî ji bo Almanya û Brîtanyayê.

**Sûdên tenduristî yên Henarê**:
1.Bergiryên laş bihêz dike û di nûtirîn lêkolînê de derketiye ku Henar xaneyên penceşêrê îmha dike û nahîle.
2.Bo jinên cudan zor baş e û oksîjîneke taybet dide der ku bo korpe zor pêwîst, baş û giring e.

3.Bo hestî zor baş e, bi taybetî bo kesên temendar
4.Dijî elzaymer û nexweşiya jibîrkirinê ye, zanîngeha Lîma Lînda ya Amerîkî dide şan ku ava henarê elzaymer nahêle.
5.Bo fişara xwînê zor baş e, zanîngeha Queen Margrêtê li Skotlandê dide şan ku rojane 500 mîlm ava henar tansyona xwînê nahêle
6.Duhna nava xwînê nahêle, Doktor Tmas Klînkî pisporê nexweşiyên dil li Amerîkayê dide şan ku vexwarina ava henarê duhna xwînê bi yekcarî nahêle û vala ye ji şekir.
7.Kêş û wezna laşê kêm dike û rê digire ji zêdebûna kerşên mirov
8.Bo cîger zor bi sûd e, çavkaniyeke sereke ya vitamin Gî û Potasyom e ku dibe sedema pakij bûna cîger, rûvî û kêm bûna hewayê sikê.

//Qendîl Şeyxbizînî
2022

Çavkanî:

-Pirtûka Yelda
-Nivîsa Soran Hemereş
-Malpera PeyamaKurd
-Malpera Basnews
-Malpera Rûdaw
-Malpera Kurdistan û Kurd